Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1250 23-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

45 sal in hunera xwe didomîne

Navenda Nûçeyan

Nebîha Feyad a 64 salî ji gundê Dêrsîwanê yê bajarokê Şera yê Efrînê ye. Dema ku Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve di sala 2018'an de hate dagirkirin, Nebîheyê tevî malbata xwe koçî Şehbayê kir û jiyana xwe li Şehbayê didomîne. Nebîha Feyad dayika 10 zarokan e, ji 19 saliya xwe ve bi derzî û tayê ji hiriyê xemlên malan dirêse û cilan ji zarokên xwe re didirû û dineqisîne. Daxwaza Nebîheyê ew e ku behreya ku ji ciwantiya xwe fêr bûye, biparêze û zarokên xwe jî li ser vê hunerê mezin bike. Nebîha her parçeyekê, bi sebir û hostayî çêdike û di encamê de berhemeke hunerî ya xweşik dertê holê. Tevî ku temenê wê mezin e jî, çêkirina berheman didomîne. Nebîhayê destnîşan kir ku nikare mîna berê bi lez çêke, lê bi israr e ku vê çandê biparêze.

Di sala 2023-2024'an de germahiya global ji asta 1.5 pileyî bihûrî

Navenda Nûçeyan

Li gorî rapora Copernicus ku saziya çavdêriyê ya Ewropayê ye, germahiya global di navbera salên 2023-2024'an de li gorî dema beriya pîşesaziyê ji asta 1.5 pileyî bihurî ye.

Nirxên germahiya global ên salên 2023-2024'an nîşan didin ku mirovahî bi avhewaya herî gerim re rû bi rû ye ku heta niha tecrûbe kiriye.
Zanyar dibêjin, germahiya heyî ya cîhanê di nava 120 hezar salên derbasbûyî de cara yekemîn digihêje vê astê.

Bûyerên Hewayî

Germahiya global ji niha ve encamên cidî bi xwe re anî: Li Mekkeyê ji ber germahiya zêde 1.300 kesî jiyana xwe ji dest dan, li Efrîkayê lehiyên mezin rû dan, li DYE'yê bahozên giran û li Kalîforniyayê jî şewata 'herî giran' rû da. Ji aliyê aborî ve jî maliyeta afetên xwezayî di sala 2023'an derdora 320 milyar dolar bû.

Okyanûs û atmosfer alarmê didin

Okyanûsan ji sedî 90'ê germahiya ji ber mirovan mêt û di asta rekorê de germ bû. Ev yek bandorê li herikîna derya û atmosferê dike, ji bo bager û bahozên mezin enerjiyê diafirîne. Copernicusê diyar kir ku di sala 2024'an de asta dûkela avê ya li atmosferê gihîştiye asta rekorê. Dîrektorê Copernicusê Carlo Buontempo got, "Bi gavên bi lez û bi biryar em dikarin paşeroja xwe biguherînin" û banga wergirtina tedbîrên lezgîn kir.

Raz û sirra xêzên Nazca

Navenda Nûçeyan

Xezên Nazca ji mêj ve ye di serî de arkeologan û pişt re xelkên ku meyla wan li ser dîrokê ye mijûl dikin. Sir û raza wan hîna jî baş nayê zanîn, lewma nayê zanîn ew bi çi awayî hatine xêz kirin. Ev xêzên ku weke "Jeoglifên fîgûratîf" tên pênase kirin ji hêla şaristaniya Nazca ve hatine xêzkirin. Nazca xelkekî kevnar ê Peruyê ye. Beriya Mîladê 200 sal û Piştî Mîladê 700 sal li Peruyê jiyane.
Ev îşaret an jî xêzên ku dişibin resmên xerîb di Mîrateya UNESCO ya Dinyayê de jî cih digirin. Di van rojên dawî de gotareke ku di kovara Proceedings of the National Academy of Sciences (PNAS) de derketiye radigihîne wan di derbarê van xêz û îşaretan de agahiyên nû bi dest xistine.
Xêzên ku bi destê xelkên Nazca hatibûn çêkirin cara ewil di sala 1927'an de hatin dîtin. Ji wê salê heta îro bi tevahî 430 xêz hatine kifşkirin. Xebata nû ya ku bi pêşengiya Zanîngeha Yamagata ya Japonyayê çûye serî radigihîne ku 303 xêzên nû yên bi vî rengî hatine kifşkirin. Ev xêzên ku nû hatine kifşkirin serê insanan, çûkan û masiyan teswîr dikin. Ji ber ku ev xêz demeke dirêj di bin axê de mane xera bûne û ji lewma jî pir kêm tên dîtin. Lê bi saya teknolojiyê êdî lêkoler dikarin bi awayekî rehetir van xêz û îşaretan kifş bikin. Xêzên ku vê dawiyê hatine dîtin nîşaneya vî tiştî ne.

Aqilê çêkirî û kifşên nû

Akadamîsyenê bi navê Masato Sakai ku pêşengiya van kifşên nû kiriye, got; "Gelek ji van xêzên ku nû hatine kifşkirin bi saya aqilê çêkirî hatin dîtin. Bi saya teknolojiyê algorîtmayeke bêhempa hatiye çêkirin. Rê û rêbazên berê pir hêdî û me ne dibirin ber bi encamekê ve lê aqilê çêkirî ev tişt ji holê rakir û niha em pir bi rehetî dikarin nexşerêyekê derxin ji bo van jeoglîfan. Armanca çêkirina van jeoglîfan beriya niha zêde nedihate zanîn, ji ber ku lêkolînerên di vî warî de dixebitin nikarîbûn xwe bigihînin agahiyan û van xêz û îşaretan pênase bikin. Lê êdî bi vê kifşa me ya dawî armanca çêkirina van xêzan baştir tê zanîn."
Li gor xebat û encamên dawî yên di derbarê van jeoglîfan de ev xêz û îşaret ji bo merasîman hatine çêkirin. Ev xêz nîşaneyên çanda xelkê Nazca ne ku behsa rêwîtiya hecê ya ber bi Cahuachi ve dikin.

Sudoku: Bersiv 28

5	2	4	3	1	7	8	6	9
3	1	7	6	8	9	4	5	2
8	9	6	4	2	5	1	3	7
2	8	1	9	3	6	5	7	4
4	6	5	8	7	2	3	9	1
9	7	3	5	4	1	6	2	8
7	5	8	1	9	3	2	4	6
6	4	9	2	5	8	7	1	3
1	3	2	7	6	4	9	8	5

Sudoku:Pirs 29

	9	3	6	8				
		5			4	6		
	4		1	2		5		
		4						
8				9				
3	6							
		7		5	2		3	
		9	4			1		
				1	7	8	4	

FERHENGA BIWÊJAN

LI SER RIZGARIYA JI TENGIYÊ

Benik li qirikê sist bûye:
- Ji tengiyê rizgar bûye.
Ji wê gerînekê derket:
- Ji wê pirsgirêkê rizgar bû.
Roj bi me jî kenî:
- Rewşa me baş bû; em ji tengiyan rizgar bûn.
Rojê çavê xwe nîşanî me da:
- Bi heman wateyê.
Roj li me derket:
- Bi heman wateyê.
Xwedê riha bavê me sitirand:
- Em bi zorê ji wê belayê rizgar bûn.

LI SER DUBAREKIRINÊ

Bûye benîşt (qajik)ê devê wî:
- Ji devê xwe dernayne; li her derê dibêje.
Bû pizika li ser zimanan/pizika li ser zimanan e:
- Li her derê bi xirabî behsa wî tê kirin.
Di nava didanan de bûye benîşt:
- Ji devê xwe dernayne; li her derê dibêje.
Kiriye benîşt di devê xwe de dicû:
- Bi heman wateyê.
Kiriye riya avê:
- Pir diçe wir; her dem diçe; ji pêwîstiyê pirtir diçe wir.
Radibe rûdine...:
- Pir wî karî dike; ji xwe re kiriye kar; ji qamê derxistiye.

LI SER DIYARÎ Û XELATKIRINÊ

Benîştê qanikan diyariya Badikan:
- Diyariya min jî li gorî min e; evqas ji min tê li min bibore. (Dema yek diyariyeke piçûk dide yekî, yan ne piçûk e lê nefspiçûkiyê dike hingê dibêje)
Benîştê kizwanan diyariya şivanan:
- Bi heman wateyê.
Diyarî qesp e şûndiyarî hesp e:
- Ku tu tiştekî piçûk bikî diyarî wê li şûna wê tiştekî mezin were; ku tu qenciyeke piçûk bikî wê bibe qenciyeke mezin li te vegere.
Hespê pêşkêşî (diyarî) didanên wî nayên jimartin:
- Dema yek qenciyê bi mirov bike, divê nebêje kêm e, yan zêde ye; diyariya piçûk û mezin weke hev in.
Sivorî (simore) û ber û minê xwe:
- Evqas ji destê min tê; xelata min li gorî min e, ne li gorê yê ez bidimê ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

'Hêza ku planên dagirkeriyê eşkere dike tê hedefgirtin'

Rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tekez kirin ku ji ber bêdengiya navneteweyî êrişên dewleta Tirk dewam dikin û gotin, "Dewleta Tirk a dagirker li çar perçeyên Kurdistanê rojnamevanan dike hedef, divê destgehên parastina mafê rojnamegeran jî bêdeng nemînin û bi erkê xwe rabin".**R-5**

Xelîl Xemgîn: Şehadeta Bavê Teyar êşeke Kurdistanî bû

Hunermend Xelîl Xemgîn diyar kir ku Bavê Teyar hunera xwe bi ziman û pîvanên gel hunand, ew li her çar perçeyên Kurdistanê dihate hezkirin, kete dilê gel û bibû kêfxweşiya li ser rûyê zarok û mezinan û got, "Şehadeta Bavê Teyar êşeke Kurdistanî bû."**R-7**

Berxwedana jinê li Bendava Tişrînê bersiva xurt li dijî dijmin e

Leyla Reşîd da zanîn ku jin siyasetên qirker ên Colanî şermezar dikin û wiha got: "Berxwedana jinê li Bendava Tişrînê bersiva herî xurt li dijî dijmin e". **R-2**

Berxwedana li Bendava Tişrînê wê şoreşa me mayînde bike

Em gaziyên şer, gel û şervanên YPG, YPJ û QSD'ê divê têkoşîna xwe bi ser bixin. Vîna gelan di ser her hêz û teknîkê re ye. Careke din soz didin şehîdên Bendava Tişrînê ku em ê welatekî azad û demokratîk diyarî wan bikin. Bêguman ê ku me fêrî berxwedaneke mezin kiriye, Rêber Apo ye.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1250 23-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

DEM DEMA DARIZANDINA DEWLETA TIRK A QIRKER E

Dewleta Tirk a qirker li Sûriyê hebûna xwe li ser dijberiya gelê kurd daye avakirin. Dagirkeriya Tirk gav bi gav plana qirkirina gelan dewam dike û hebûna xwe li herêmê berfireh dike. Piştî hilweşandina rejîma Baas jî ev rewş nehat guhertin. Gef û êrişên dewleta Tirk ên li dijî herêmê dewam dikin. Li gorî pênaseyên Neteweyên Yekbûyî (NY) êrişên dewleta Tirk ên li dijî herêma Bakur û Rohilatê Sûriyê sûcên herî mezin ên şer in. Niha jî dem hatiye ku dagirkeriya Tirk were darizandin.**R-3**

Ridwan Îsmaîl: Malbat evîna biçûk e têkoşîn evîna mezin e

Ridwan Îsamîl girtiyê ku zêdeyî 33 salan di zindanên dewleta Tirk a dagirker de li ber xwe daye diyar kir ku her çiqas dijmin dixwest polîtîkayên xwe li hemberî wî bide meşandin, lê ew li hemberî van polîtîkayan radiwestiya û got, "Tevî binçavkirinê, min partî û gelê xwe diparastin".**R-6**

Roja Zimanê Dayikê ya cîhanî
Ahmet Aktaş R-4

Siwarê Hespê Heqîqetê Kurê Çiyayê Kurmênc Egîd Roj
Idris Henan R-5

Pêvajo û berpirsyarên me
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

Berxwedana jinê li Bendava Tişrînê bersiva xurt li dijî dijmin e

Leyla Reşîd da zanîn ku jin siyasetên qirker ên Colanî şermezar dikin û wiha got: “Berxwedana jinê li Bendava Tişrînê bersiva herî xurt li dijî dijmin e”.

Birûc Resûl/Qamişlo

Bendava Tişrînê ku îro bi bendava berxwedanê tê nasîn, her wiha ev 28 rojin berxwedaneke bê hempa ji aliyê gel û şervanan ve tê meşandin. Li kêlek wê jinên ku berê xwe didin bendavê berxwedaneke pir mezin didin meşandin û parastina xak û ava xwe dikin. Jin bi tevlîbûna xwe di nobeta li bendava Tişrînê dibin bersivek herî mezin ji dijmin re ku ew nikare ti carî vê xakê dagir bike.

Têkildarî berxwedana jinê ya di nobeta li bendava Tişrînê û girîngiya bicihbûna jinê di nav destûra nû ya Sûriyê û bandora siyaseta Colanî li ser herêmê bi giştî, bi taybet li ser jinê wê çawa be? jina bi navê Leyla Reşîd ku li bendava Berxwedanê “Tişrîn” di nav nobeta gel de cihê xwe girtiye ji Rojnameya me re ev nirxandin kir:

‘Mafê jinê di Sûriyeya nû de mefekî sereke ye’

Leyla Reşîd diyar kir ku dema ew behsa Sûriyê dike, yekser edalet, wekhevî û aşîtî tê bîra me û wiha pê de çû: “Em weke jinên Sûriyê di nav gelek geşedanan re derbas dibin. Bi taybet piştî hilweşandina rêjîma Baas ku bi salan serwerê Sûriyê bû. Her wiha ji pirbûna netewên li Sûriyê gelek nelihevkirin hebû. Niha jî Sûriyeyek lezgîn bi destê Colanî tê avakirin. Li gorî nêrîna min Sûriyê nayê avakirin lê belê tê xirabkirin. Ji ber ku kesê gelekî bi rê ve bibe, kuştinê nake. Diziyê nake, serê gel jênake û hwd nake. Ji destpêka hatina Colanî li ser desthiladariya Sûriyê tiştên xirab tên qewimandin. Ji ber vê yekê jî ev kes nikare Sûriyê ava bike yan jî gel bi rê ve bibe. Ya herî zêde ku wê sîstema demokrasiyê jî holê rake ew neqebûlkirina jinê ye, Colanî pêşketina jinê qebûl nake û dixwaze her tim jin di bin destê zilamê serdest de be. Ez dikarim bibêjim ku Colanî dixwaze Sûriyeya berî sed salî di roja me ya îro de vegerîne. Mafê me wek jin pir heye û em stûna sereke ya civakê ne, jinên îro ne yên berî sed salî ne û em ê nehêlin va sîstema qirker mafê me bixwe û me ji civakê tune bike. Di heman demê de mafê me yê avakirina civakê di hemû aliyên siyasî, tendirûstî, perwerde, doplomasî, aborî, û hwd de heye. Lê xuyaye ku dewleta Tirk û Colanî ji pêşketina jinan ditirsin, ji bo vê yekê naxwazin jin di van qadan de cihê xwe bigrin”.

‘destpêkirina şoreşa Rojava re Jin bûn xwedî hêz’

Leyla Reşîd di nav axaftinên xwe de anî ziman ku bi rêveberiya Xweseriya demokratîk re jinê di nav gelek saziyên civakî, siyasî û aborî de cihê xwe girt û got: “Em wek jin berî Şoreşa Rojava ya ku bi navê Şoreşa Jinê hat nasîn, bindest bûn me nikarî gotinek li hemberî zilamê serdest bikira ji ber ku ew xwe serwer didît. Di heman demê de em ji her qadên civakê mehrûm bûn, me nizanîbû em kî ne û cewherî jinê çi ye? Lê bi Şoreşa Rojava re ku çirûska Jina azad bû, em ji qalibê zilamê serdest rizgar bûn. Êdî me maf û cewherê xwe nas kir. Êdî hêza me ya biryardayîna jiyanê çêbû. Colanî jî vê yekê qebûl nake û dixwaze jinê weke berê bê maf bihêle”.

‘Ev 2 carin bi kerwanên gel re tevlî nobeta Tişrînê dibim’

Leyla Reşîd got ku dewleta Tirk û çeteyên wê êrîşî bendava Tişrînê dikin û dixwazin bendavê dagir bikin, Leyla Reşîd wiha axaftian xwe dewam kir: “Ez wek jin ji bo parastian axa xwe û ava xwe, du carin bi kerwanên gel re derbasî nobeta bendava Tişrînê dibim. Berxwedana jinê bi rola radibe ku di cewherê êrişan de Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî têye hedefgirtin. Ji ber ku dizane stûna sereke ya vê civakê jin e. Ji ber vê yekê dewleta Tirk a dagirker bêserûber, bi awayekî dermirovî êrişî jinê û sivîlan dike û komkujiyan pêk tîne. Ev yek di zagonên cîhanî de nayê qebûlkirin ji ber dema em diçin bendavê em çekan ranakin û em êrîşî wî nakin lê tenê em ji bo parastina av û axa xwe tên vê herêmê. Dewleta Tirk a dagirker dizane ku bendav çavkaniya aborî ya gel e, lê rûxmî wê jî êrîş dike. Dema em berê xwe didin bendava Tişrînê ne tenê ji bo parastina gelê Kurd e, ji bo parastina giştî gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Bendava Tişrînê ji bo tevahî pêkhateyên Sûriyê cihê herî girîng e, bi vê yekê em bi hemû pêkhateyên xwe re li vê bendavê dicivin û parastinê dikin. Ez vê kêliyê li bendava Tişrînê bi gel re nobetê digrim, heya vê kêliyê jî dewleta Tirk a dagirker balefirên şer li ser me sivîlan digerîne û her kêliyekê derdora bendavê bombebaran dike ku me bitirsine û bendavê teslîmî wî bikin”.

‘Colanî wê hîn bêhtir Sûriyê xirab bike’

Leyla Reşîd axaftina xwe bi vî rengî qedand: “Gelên Sûriyê di pir zehmetiyan re derbas bûne, bi taybet gelê Kurd ku bi sîstema qirêj a Baas re bê nasname mabû. Weke şêniyên Efrînê jî em du caran bi zorê hatin koçberkirin. Dewleta Tirk a dagirker di rojekê de bi 72 balefiran axa me bombebaran kir. Rûxmî wê jî em teslîm nebûn û me 58 rojan li ber xwe da. Piştî wê jî bi zorê em koçberî Şehbayê bûn û 7 salin li wir jî me li ber xwe da. Li wê derê me ji nû ve jiyan ava kir û axa ziwa bi gul û şînatiyan xemiland. Dîsa carek din çeteyên dewleta Tirk û Heyet Tehrîr El-Şam êrîş kirin û em ji wir jî bi zorê hatin koçberkirin. Di vê koçberiyê de me gelek zehmetî kişandin gelek zarokên me hatin revandin, gelek kal, pîr û zarokên me ji qehran re, li ser rêya ber bi hermên Rêveberiya Xweser ve jiyana xwe ji dest dan. Ev hemû jî Colanî bi serê me kir ka wê çi hêviya me bi vî kesî bimîne ku rojane kuştin û ravendinê dike. Gelo wê ji me re Sûriyeyek çawa ava bike? Ez bi xwe bawer nakim ku Colanî wê vê yekê bike. Em wek jin vê yekê şermezar dikin û pêwîste zihniyeta yek ol ji holê rabe, ji ber ku gelek ol di Sûriyê de hene û pêwîste mafê wan jî were parastin û neqencî di derheqê wan de neyê kirin. Di dawiyê de ez dibêjim ku wê Colanî nikaribe Sûriyek demokratîk û wekhev ji gel re ava bike, berovajî; wê Sûriyê hê xirabtir bike”.

Meclisa Jinan amadekariyên kongreyeke nîştimanî ya jinan dike

Meclisa Jinan a Sûriyeyê bi armanca lidarxistina kongreyeke nîştimanî ya jinan ku mafên wan di siberoja Sûriyeyê de mîsoger bike, civînan li herêmên cuda yên Sûriyeyê li dar dixe.



Endama Koordînasyona Giştî ya Meclisa Jinan a Sûriyeyê Gulan Silêman der barê xebatên meclisê û hewldanên wan ên ji bo mîsogerkirina mafên jinan di Sûriyeya nû de, ji ajansa ANHA'yê re axivî.

Gulan Silêman di destpêka axaftina xwe de pêvajoya ku Sûriyeyê tê re derbas dibe wek “hestiyar” bi nav kir û got: “Meclisa Jinan a Sûriyeyê li gorî vê pêvajoyê tev digere. Yek ji armancên me yên stratejîk ku me li destpêka avabûna meclisê ve ragihandiye, ew e ku em xwe bigihînin tevahî jinên sûriyeyî yên li hundir û yên li derve.”

Têkildarî pêvajoya piştî rûxandina rejîma Baasê jî Gulan Silêman got: “Me xwest çarçoveya karê xwe berfireh bikin û têkiliyan bi hemû kesayetên serbixwe, tevger û rêxistinên jinan re ava bikin. Di vê çarçoveyê de me gavên girîng avêtin. Di serî de Heleb û Şamê me li gelek bajarên Sûriyeyê panel û komxebat li dar xistin. Ji bo birêxistinkirina jinên ji pêkhateyên cuda yên Sûriyeyê, ji bo tevlêkirina jinan di nava meclisê de û her wiha ji bo yekkirina dengên jinan hewldanên mezin têne kirin.”

Der barê hikumeta pêvajoya derbasbûnê de jî Gulan Silêman wiha axivî: “Heya niha me tu garantiyên parastina mafên jinan û beşdariya wan di hikumet û tevahî qadan de wernegirtiye. Jinan di rêya vê şoreşê de fedakarî kirin, hatin girtin û revandin û zext li wan hatin kirin, ji ber vê yekê diviyabû ev fedakarî di ber çavan re bihatana girtin û nûnertiya jinan di hikumetê de mezintir bûya. Niha rola jinan hatiye dûrxistin. Tunebûna rola jinan di hikumetê û tevahî qadan de ji bo siberojê nîşaneyeke xeternak e. Heke hin jin di hikumetê de cih digirin jî dê temsîla wan şeklî be û ne cidî be. Piştî ew qas fedakariyan ku jinan dane, em bi tu awayan qebûl nakin ku jin di siberojê de werin dûrxistin. Me ev mijar û mijara çawaniya mîsogerkirina mafên jinan wekî xalên bingehîn di civînên vê dawiyê de nîqaş kirin.”

Amadekariyên lidarxistina kongreyeke nîştimanî ya jinan

Gulan Silêman diyar kir ku Meclisa Jinan a Sûriyeyê bi israr e ku mohra jinan di biryargehan û nivîsandina destûra nû ya Sûriyeyê de hebin. Her wiha destnîşan kir ku ew bi lidarxistina rêzecivînan li deverên cuda yên Sûriyeyê amadekariyên lidarxistina kongreyeke nîştimanî ya jinên sûriyeyî dikin û wiha pê de çû: “Em amadekariyên kongreyeke nîştimanî ya jinên sûriyeyî dikin. Em hewldanan dikin ku ji tevahî herêman û hemû pêkhateyan temsîla jinan were mîsogerkirin. Em hewl didin ku tevahî jinên sûriyeyî wê bi rengên xwe û îradeya xwe û dengê xwe beşdar bibin da ku biryarên di kongreyê de werin dayîn wekî reşnivîsekê were destgirtin ku îradeya jinan îfade bike.”

Der heqê siberoja Sûriyeyê de jî Gulan Silêman got: “Her kes dişopîne û dipirse. Heke em li pêkhatina Sûriyeyê meyze bikin em ê bibînin ku Sûriye di aliyê dîrokî û erdîngarî de mozaîkeke rengîn e û gelek pêkhate bi hev re lê dijîn. Lê Sûriye di gelek qonaxan de di şeran re derbas bû. Tevî hilweşîna rejîma Baasê jî şer li hin herêman wekî Bendava Tişrînê dewam dike. Zêdetirî vê yekê di gelek aliyan de wekî binesazî û civakî de pirsgirêk hene. Gelên herêmê êdî piştî ketina rejîma Baasê dixwazin pêvajoya yek reng, yek al û yek biryar derbas bikin. Em bi hêvî ne ku Sûriyeya pêşerojê nenavnedî be ku rêzê li hemû pêkhate û rengên wê bigire. Her wiha bi hêvî ne ku Sûriyeya siberojê li ser bingehên pirrengî û demokasiyê be û bi navê Komara Sûriyeyê de bi sîwana xwe û karê xwe yê yekbûyî ji bo tevahî pêkhate û rengan be. Divê Sûriye ne li ser esasê yek ol û yek rengî be.”

Xelîl Xemgîn: Şehadeta Bavê Teyar êşeke Kurdistanî bû

Hunermend Xelîl Xemgîn diyar kir ku Bavê Teyar hunera xwe bi ziman û pîvanên gel hunand, ew li her çar perçeyên Kurdistanê dihate hezkirin, kete dilê gel û bibû kêfxweşiya li ser rûyê zarok û mezinan û got, “Şehadeta Bavê Teyar êşeke Kurdistanî bû.”

Ronaz Silêman/Qamişlo

Di dîrokê de mirovên bibandor û hezkar derdikevin holê. Ev mirov ne ji rêzê ne, ji ber ku şopa tiliyên xwe di rûpelên dîrokê de dineqişînin, sedema wê ku xwediyê ruhê fekedarî ji bo gel û welatê xwe ne. Yek ji mirovên ku di bîr û baweriyên gelê Kurdistanê de nayê jibîrkirin jî Bavê Teyar e. Bavê Teyar ne tenê kenek li ser rûyê Kurdistaniyan bû, lê di deman demê de bi hunera xwe êş, xemgînî û rastiya ku li ser gelî wî dihat kirin bi berhemên xwe yên şanogeriyê derdxist holê. Di heman demê de xwediyê hestên bilind ên welatparêziyê bû, lewra şehîdxistina wî bandoreke mezin li ser Kurdistanê û mirovên wî nas dikir, kir.

Derbarê bandora hunera şehîd Bavê Teyar Cuma Xelo li ser hunermendên Kurd, hunermend Xelîl Xemgîn ji rojnameya me re axivî.

‘Bavê Teyar kêfxweşiya li ser rûyê gelê Kurdistanê bû’

Xelîl Xemgîn diyar kir ku wî ji nêz ve Bavê Teyar nas dikir û wiha got: “Ez şehîd Cuma Xelo ku bi Bavê Teyar dihat naskirin, ez wî bi navê hunermendê gel, civak û şoreşê bi nav dikim. Naskirina min ji Bavê Teyar re di aliyê fikir, sekin, xeyal, bîr, bawerî û hemû aliyan de ji nêz ve bû. Tevî ku derfetên şanogerê birûmet Bavê Teyar di aliyê hunerî, şano, sînama, karê akademîk û berhemên perfesyonal pir kêm bûn jî, lê bi wan derfetan hestên xwe yên civakî û kurdewarî, ji roja destpêka şoreşê dest pê kirî û vir de, mîna têkoşerekî xebatên xwe dida meşandin. Bavê Teyar hunera xwe bi ziman û pîvanên gel û ji bo gel hundand. Perensîbên şoreşê jî ew e ku huner a gel e û ji bo gel tê kirin. Mezinbûna Bavê Teyar di vê yekê de diyar bû ku hunera xwe ne bi teknîkên mezin, akademîk û tiştên ku niha teknîk zêde li pêş kirî çê dikir. Lê bi hestên kurdewariyê hemû berhem çê dikir, ji bo wê jî li her çar perçeyên Kurdistanê û di nava kurdan giştî de, gelekî hate hemêzkirin, kete dilê gel û bibû kêfxweşiya li ser rûyê mezin û zarokan, ev rastiyeke kes nikare wê inkar bike. Bavê Teyar hunermendekî ku ji nava cerga gel, ji ruhê civakê, herwiha di wî ruhî de maye û wê bimîn e.”

‘Bavê Teyar bû serkêşê kerwanê şoreşê û şanogeriya kurdî’

Xelîl Xemgîn anî ziman ku Bavê Teyar ne tenê weke hunermendekî bû lê di her xebatê de fedekarek bû û wiha got: “Bavê Teyar tenê wek hunermendekî nebû, lê weke kedkarekî şoreşê û fedekarekî welat jiyana xwe dewam kir. Rîya xwe ji bo civak, gel, azadî, wekhevî û aramiya gel da meşandin, ji vê riyê derneke û qet newestiya jî. Peyv nikare Bavê Teyar bi qasî sekin, xebat, helwest, çalakî û berxwedana wî kirî şîrove bike. Peyama Bavê Teyar a dawî ku li ser Bendava Tişrînê dayî, ji bo me gelekî bi wate û girîne. Bavê Teyar wê di dilê gel de mayînde bimîne û wê tim bijî. Di heman demê de bû serkêşê kerwanê şoreşê û şanogera kurd. Şoreş tiştê ku ji gel dixwaze ew e ku yê leşker karê leşkerî baş bike, siyasetmedare siyasetê rast bike, xwendevan hîn bêtir xwe zane bike, ji hunermend jî ew dihat xwestin ku hunera wî malê gel be. Bavê Teyar jî mînaka vê yekê bû ku bihûrî bihûrî her erkên xwe hemû pêk anîn. Bavê Teyar ew kela ku di dilê wî de dikeliye, nikarî giştî bikra berhem û pêşkêş bikra, ji bo wê gelek caran rexneyên wî ji bo me û ji bo derfetan hebû. Lê wî bi ruhê xwe dikarî berhemên gelekî mezin biafirandiba û diafirnand jî.”

‘Şehadeta Bavê Teyar êşeke Kurdistanî bû’

Xelîl Xemgîn axaftina xwe wiha qedand: “Şehîdxistina Bavê Teyar ji

bû gelê Kurdistanê, bi taybet ji bo hunermend, rewşenbîr û nivîskaran windahiyeke gelekî mezin e, gelê kurd tevahî bi vê windahiyê êşiya ye. Lê ew peyama ku wî herî dawî li Bendava Tişrînê dayî, ji bo kesên ku dibêjin em hunermendin, rewşenbîrin û kurdên welatparêzin, her kes xwe di wê peyamê de dibîne, yên ku xwe nabînin wê demê ne çavên wan, lê wijdan û guhên wan kurin. Mirov nikare Bavê Teyar bi pênaseyan pênase bikin, lê bi hewlet, kar û fedekariyên xwe dikarin bersiva peyama wî bide. Gelê me yê kurd, bi taybet ên Rojava di pêvajoyekî gelekî zehmet re derbas dibin, li hember qirkirina rojane rû bi rû ne, her roj li ser bendava berxwedanê şehîdan didin, lê li ber xwe dide. Çareyekî me jî, ji bilî berxwedanê tuneye. Bavê Teyar di peyama xwe ya dawî de ev got, “Em natirsin. Em ne kurdên berê ne. Serê xwe ji kesî re danayînin. Em dijminatiya kesî nakin, em azadî, hebûn û nasnameya xwe dixwazin. Ev ax axa me ye” ev gotinên Bavê Teyar e, lewra ez di kesayeta Bavê Teyar de hevalên pêre şehîd ketin û şehîdên di wê oxirê de xwe feda kirin, bi rêz û hirmet bi bîr tînim û dibêjim; em şopdarên rêya we ne.”

‘Hunermend şervanê gel e’

Argêş Vîyan/Qamişlo

Rêveberê TEV-ÇAND'ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ronî Ekîn da diyarkirin ku di vê pêvajoyê de erkê herî mezin dikeve ser milê hunermendan û wiha got: “Em weke civak jî di kêleka şerê leşkerî de şerekî çandî û hunerî didin meşandin.”

Di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de êrîşeke pir alî tê meşandin. Li Bendava Tişrînê ji aliyê şervanên QSD'ê û YPJ'ê ve berxwedaniyeke bêhempa tê meşandin. Hemû beşên civakê jî, piştgirî didin vê berxwedana bêhempa ya ku roj bi roj dîrokê ji nûve xêzdike. Ji milê çand û hunerê ve jî, bi pêkanîna gelek çalakiyên cûrbecûr piştgirî ji bona vê çalakiyê tê kirin.

Derbarê giringiya hunerî û piştgiriya hunermendan ya ji bona berxwedana Bendava Tişrînê de, Rêveberê TEV-ÇAND'ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ronî Ekîn ji rojnameya me re axivî.

‘Şerê ku tê meşandin ne tenê leşkerî ye, di heman demê de çandi ye’

Ronî Ekîn anî ser ziman ku êrîşên tên meşandin, ne tenê di qada leşkerî de sînordar dimînin, êrîşên li ser çand û hunera gelê Kurd piralî tên meşandin û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Tê zanîn ku ev demeke li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrîşên hovane tên meşandin. Ev êrîş tenê bi qadekê û beşekî civakê ve, ne sînordar e. Ji bona ku gelan bi pişaftin û qirkirinê re, rûbirû bihêlin di aliyê çand û ziman ve jî êrîşan didomînin. Raste di şerê leşkerî de, şer bi çekan tê meşandin, lê di şerê hunerî de jî bi pêşxistina huner û çandê şer tê birêvebirin. Em jî weke hunermend di Tevgera Azadiyê de, şerekî hunerî li hemberî pişaftinê û bi riya çand û hunerê didin meşandin. Şerê leşkerî û şerê çandî hev temam dikin û ev yek astekê dide têkoşîna gelê Kurd. Hunermend ger ku bi xebat û hunera xwe di dilê civakê de mayinde nebe serkeftinên ku têne jiyan kirin wê kêm û nebes bimîne. Têkoşîna çandî jî bi perwerdê destpê dike û xwe gehiştina asta bilind berdewam dike. Şer û pevçûnên ku tên meşandin jî, armanca wê qirkirina çandî ye. Ji ber ku hunermend dema tê xwastin şervanê gel e, di heman demê de jî şervan jî hunermend e. Jiyana ku birûmet tê jiyan kirin, hewildide pûç bike û hundirê wê vale bike. Ev tinekirin di aliyêkî de jî, dervî exlaqî û zagonî ye. Ji ber vê yekê xebatên hunerî ji bo civakê, pêwîste herî zêde di vê pêvajoyê de werin meşandin û pêwîste ku hunermend ristekî mezin bileyizin. Dijmin hewil dide di kesayeta kurd de, ezezîtî pêşbixe û nehêle ku xwe bighîne asta cîhana zanistî. Herwiha di nava civakê de pêşxistina fihûş, bikaranîna madeyên hişbir û bi kuştina jinan ve, civaka ku bi ramanên Rêber Apo hatiye avakirin ji holê rabike. Hişmendiyekî navendî, bi yek kesê/î we girêdayî hewildide ku pêşbix e. Ev siyaseta şerê taybet ya ku tê meşandin hatiye teqezkirin û dewleta Tirk ya dagirker bi salane kiryarên bi vî şêwazî pir bi zanebûn û pisporî dimeşîne. Hebûna xwe, bi tinebûna civakeke din ve girê dide. Wê jî bi riya çandî û bişaftinê pêktîn e. Emê bi stran, awaz û şanoyên xwe herî zêde pêşengî bidin azadiya jin ê. Çand û hunera berxwedanê û bi salan li hemberî hişmendîya zilamsalar berxwedanî meşandîy e.”

‘Em şagirtên Bavê Teyar û Yekta Herekolin, emê bibin şopdarên riya wan’

Ronî berxwedaniya li Bendava Tişrînê dimeşe silav kir û wiha axaftina xwe domand: “Ev nêzî 2 mehin êrîşeke mezin li ser Bendava Tişrînê hatiye destpêkirin. Rojane êrîş li ser şervan û gelên diçin li wê derê piştgrîyê didin şervanan tê kirin. Em jî weke endamên TEV-ÇAND'ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi plansaziyên xwe yên cûda tevlî berxwedaniyê dibin û piştgirî didin şervanên QSD û YPJ'ê. Pêşengên şanoya Kurdî, Cûma Xelîl bi navê hünerî Bavê Teyar dema ku tevlî berxwedaniya gel dibe, di encama êrîşa dewleta Tirk ya dagirker de şehîd ket. Em bi film û şanoyên Bavê Teyar mezin bûn, Bavê Teyar dema di rûyê mirovan di ken xêz dikir û di heman demê de jî dida fikirandin, mînaka şoreşger û hunermendiya Bavê Teyar e. heya kêliyên xwe yên dawiyê jî anî ser ziman û got “me kefenê mirinê çirandî ye.” Ev gotinê wî bûn dîrok û navê berxwedana hünerî. Bi wê xebata xwe Bavê Teyar bû şervanê gel. Em şagirtên Bavê Teyar û Yekta Herekola ne û wan mîrateya bi mere hiştine emê berdewam bikin. Rêber Apo dibêjê “Dibe hunermend dilê wî/ê weke pola be.” Ji ber ku hest û ramanên herî mezin li gel hunermenda ye.”

‘Em ê nehêlin ku nifşên nû bi derewên dagirkeran mezin bibin’

Ekîn got ku emê weke hunermend erkên li ser milê xwe pêkbînin û axaftina xwe wiha qedand: Nifşên nû yên ku bi pêşengtiya gelê Kurd bikin hewildide ku dijî şoreşê bikarbîne. Stranên kurdî û kartonfilmên kurdî jî qedexe dike û bi alavên şerê taybet pêşiya civakê digire. Ev yek dide xuyakirin ku em bi çi rengî têkoşînê di nava şoreşê de bidin meşandin, lê dijminê gel û civaka xwe baştir nasbikin. Bangawaziya min ji hemû hunermendên derveyî welat dijîn re ew e, ku piştgiriyê bidin gel û hêza xwe. Herwiha bi şano û stranan, bi xêzkirina tabloyekê dikarin piştgiriyê bidin şoreşê û deskeftiyên Kurdistanê. Em jî weke hunermend soza ku me ji Bavê Teyar re daye em nû dikin û em ê hertim li kêleka gel û şervanên xwe cih bigrin.”

Ridwan Îsmaîl: Malbat evîna biçûk e têkoşîn evîna mezin e

Ridwan Îsamîl girtiyê ku zêdeyî 33 salan di zindanên dewleta Tirk a dagirker de li ber xwe daye diyar kir ku her çiqas dijmin dixwesť polîtîkayên xwe li hemberî wî bide meşandin, lê ew li hemberî van polîtîkayan radiwesťiya û got, "Tevî binçavkirinê, min partî û gelê xwe diparasťin".

Ronahî Sadûn/Qamişlo

Bi hezaran parlementerên Kurd, kesayetên siyasî, rewşenbîr û azadîxwaz di zindanên dewleta Tirk a dagirker de têne dîlgirtin. Girtiyên di zindanan de, bi îşkenceya fizîkî û ya pîskolojîk rû bi rû ne. Di heman demê de dewleta Tirk li gorî xwe zagonên ku ne li Tirkiyê û ne jî li cîhanê têne pejirandin, dinivîse û li ser girtiyan disepîne.

Yek ji girtiyên ku 33 sal û nîvan di girtîgehên dewleta Tirk a dagirker de hatibû dîlgirtin, Ridwan Nesrî Îsmaîl e. Ridwan Nesrî Îsmaîl ji gundê Sinceqa Sedûn a girêdayî bajarê Amûdê ye. Ridwan ji bo doza gelê xwe tevlî Tevgera Azadiya Kurdistanê bû, da ku mafên xwe yên çandî, siyasî û çarenûsa xwe wergire. Lê li Bakurê Kurdistanê ji ber xebatên xwe yên siyasî tê girtin û bi vê sedemê cezayê heta hetayê lê tê birîn. Li gorî zagonên Tirkiyê kesên ku cezayê muebed lê tên birîn, piştî 30 salan divê bê berdan. Tevî ku cezayê Ridwan di 28'ê Tebaxa 2021'an de bi dawî bû, lê bi hincetên cuda 3 sal û nîv li cezayê wî hate zêdekirin.

Ridwan Nesrî Îsmaîl di sala 1961'an de, li gundê Sinceqa Sedûn a bi ser bajarê Amûdê, di nava malbateke welatparê de, ji dayîk bûye. Ridwan di zarokatiya xwe de nûçeyên Kurdî dişopandin û di nava lêgerîna siyasî de jiyan dikir. Lew re çi tevgereke kurdî rasterast ku ji bo gelê kurd kar û xebat dida meşandin bi fikir û ramanên xwe li wir bû.

Ridwan piştî lêgerînên xwe yên siyasî, Tevgera Azadiya Kurdistanê nas dike. Êdî di sala 1985'an de dibe xwedî biryar ku tevlî Tevgera Azadiya Kurdistanê bibe. Tevî ku zarokên wî hebûn û destê wî astengdar bû, lê ew ji biryara xwe venegeriya. Li ser vê bingehê di 1989'an de bi temamî têkiliyên xwe yên malbatî qut dike. Îsamîl di dawiya sala 1990'î de beriya kongra 4'emîn ji Rojava ber bi Başûr ve diçe û tevlî Tevgera Azadiya Kurdistanê dibe.

Lê di 5'ê Îlona 1991'an de li herêma Gulpînarê li Wanê tevî 4 hevalên xwe, ji ber xebatên xwe yên siyasî ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hate girtin û cezayê heta heyatê lê hate birîn. Ridwan Nesrî Îsmaîl ku ji aliyê dijmin ve bi navê Dijwar dihate naskirin, piştî 33 sal û nîvan ji zindanên dewleta Tirk azad dibe. Ridwan Îsmaîl têkildarî kar, xebat

û girtina xwe ji rojnameya Ronahî re axivî.

'Tevgera Azadiyê hucreyek mejiyê min e'

Ridwan Îsmaîl diyar kir ku piştî naskirina wî ji Tevgera Azadiya Kurdistanê re, êdî tevgera azadiyê bû hucreyek mejiyê wî û wiha got: "Di bingeha xwe de ez li Tevgera Azadiyê geriyam. Piştî ku min Tevgera Azadiyê nas kir û şûn de, tevger bû hucreyek mejiyê min û parçeyek ji dilê min. Bi taybet piştî ku min heval dîtin, her wiha li berxwedana zindanan guhdar kir, êdî tu hêzek nema karîbû min ji vê tevgerê dûr bixe. Her tim min ji xwe re digot; "Eger hebûna min bikeve devê topekê û perçeperçe bibe, wê Tevgera Azadiyê mîna hesinkêşê wan perçeyên canê min kom bike". Dibe ku tevgerên din jî heta astekê xizmeta doza Kurdî dikirin. Lê ez gihiştibûm encamekê ku tu tevger weke Tevgera Azadiyê wê xizmeta doza Kurd bi rengekî rast bike û me bighîne daxwazên me, tune bû. Lew re di demeke kurt de min biryar da ku ez tevlî Tevgera Azadiya Kurdistanê bibim. Ji ber ez di wê baweriyê de bûm ku eger sekina min nebe perçeyek ji tevgerê, nexebitim û hêza xwe nexim xizmeta wê û doza Kurd, wê demê, ez ê mîna kesekî nexweş bim. Lê mixabin derdora min dixwestin astengiyan li pêş tevlîbûna min derxînin. Lê min got eger ez tevlî Tevgera Azadiyê nebim, enerjiya xwe nexim xizmeta gelê Kurd û tevgerê, ez ê nexweş bim."

'Evînên biçûk dibin qurban ji evînên mezin re'

Ridwan Îsmaîl anî ziman ku malbat evîna biçûk e lê têkoşîn evîna mezin e û wiha got: "Tevî ku girêdana min bi zarok û malbata min re hebû, lê li cem min malbat evîna biçûk bû, têkoşîn û Tevgera Azadiyê jî evîna mezin bû. Lew re bê çare nîn bû ku evînên biçûk bibin qurban ji evînên mezin re. Li ser vê

bingehê min têkîliyên xwe yên aborî ji malbatê qut kir. Tevlîbûna min jî, ji Tevgera Azadiyê re beriya Kongra 4'emîn bû. Wê demê tevlî têkoşîna çekdarî bûm, piştî wê bi şûn de, em li ser herêman hatin belavkirin. Hin herêm li hemberî me hatibûn girtin, lê hewledanên min ji bo vekirina wan herêman û xizmeta wan hebû. Ez ji bo rizgarkirina welat û gelê xwe dixebitim. Parastina doza gelê Kurd erkekî me yê sereke ye. Ez di 5'ê Îlona 1991'an de, ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatim girtin. 13'e rojan di girtîgeha Gulpînarê de mam. Sawciyên zindanê dixwestin antîpropogadna li ser me bidin meşandin û digotin; çawa jin li cem we ne? Lê bersiva min ji bo wan ew bû ku li cem me ji xwîşk û biratiyê bêtir li hev xwedî derdikevin, canê xwe ji bo hev didin. Wan îslam dikirin hincet, lê min bersiva wan dida û mînakê şoreşa îsalmê ku jinan serkêşiya wê dikirin, dida wan. Êdî ji min re digotin tu hatiye girtin çima tu li ber xwe didî? min got; dema mirov bê girtin nayê wateya ku teslîm bibe. Dema mirov li ser rastiyê be, wê heta dawiyê mafê xwe biparêze. Sawciyên zindanê di dema dawiyê bandor bibû, ji min re digotin tu tiştekî dixwazî? min digot tiştekî tenê dixwazim "PKK ne tevgereke terrorist e, PKK ji bo mirovahiyê û hemû gelên bindest e, hem li vir ji bo gelên Kurd û Tirk têkoşînê dide meşandin, ez hêvî dikim bi vî çavî mêze bikin, bi çavê terorîzmê mêze nekin." Xebatên min di vê çarçoveyê de dihatin kirin".

''Tevî binçavkirinê, min partî û gelê xwe dipartastin"

Ridwan Îsmaîl axaftina xwe wiha qedand: "Di sala 1991'ê de hatim girtîgeha Amedê. Lê zindana Amedê bi serkêşiya berxwedana şehîd Mezlûm Dogan, Kemal Pîr û hevalên din zemînek dabû afirandin û risteke girîng lîstibû ku mercên cezayê ne weke berê bûn. Di heman demê de têkoşîna gerîlayan zextên li ser zindanê rakirin. Em jî hatin li ser vî mîrasê rûniştin, ev jî mîrasê şoreşê û şehîdên mezin bû. Di zindanê de bi pergalî işkence nemabû, dem dema dixwest mirov ji tevgerê û doza Kurd qut bike, armancên wan ev bûn. Tevî Pergalî tunebû jî, lê nayê wateya ku nakujin û ezeziyet jî rabûye. Bi vî rengî 33 sal û nîvan li zindanê mam. 30 salên xwe me qedandin û şûn de dijmin siyasetek derxist. Tevî ku li gorî Tirkiyê cezayê muebed 30 salin, zêdeyî wê jî tuneye, lê li cem xwe hin zagonên ku ne li Tirkiyê û ne jî li cîhanê têne pejirandin derxistin. Di her hêlê de xwestin me bihêlin, lê li her derê jî, ew zagon nexistin meriyetê, ji ber ku derveyî zagonên hiqûqî bûn. Dibe ku kêmasiyên min hin caran derketibin, lê şert û merc çiqasî zor bin jî, ji parastina mafê gelê xwe paş de vengeriyam. Tevî binçavkirinê, min partî û gelê xwe diparastin. Di zindanê de derveyî daxwazên gel min tevger nekiriye û tu lewaztî nîşa nedaye. Her çiqas dijmin dixwest polîtîkeyên xwe li ser min bisepîne, lê ez li hemberî wî radiwestiyam".



Pêvajo û berpirsyarên me

Hafiz Ahmet Turhalli

Ev demekî dirêje şer û pevçûn di navbera kurdan û dewletên dagirkerên Kurdiśtanê de berdewam dike. Weke tê zanîn ev şer carnan gur dibe û carnan jî sisî dibe. Ev zêdetirî sed sal in kurd bi dewleta Tirk re di nava şer de ne. Ji 13'yê Sibata 1925'an û virde ev şer bi şîwazên curbecur berdewam dike.

Bi hezaran gund, navçe û bajêr hatin sotin û xirakirin.

Bi sedhezaran mirovan jiyana xwe ji desť dan. Dewleta Tirkan tu carî desťê kurdan yê aşitiyê negirt. Ji ber her dem wê êrişî kurdan kiriye. Rêveberiya vê dewletê çanda wê ya aşitiyê nîne. Tu demê ev desthilat bi aşitî û wekheviyê nehiziriye, lewre çanda wê ya talan û êrîşê ye. Ev rasťiya wê desthelata hov, hema her kes dizane û ev desthelat jî vê tiştî venaşêre. Ji pirtûkên wan ên dibiśtanan bigre, heya xwendina xutbeyên olî, ji propagandaya çapemeniyê bigre heya kolanan dibêjin em ew êrişkerin û talanan pêk tînin; ewên ku şûr di desť de ye, li ser pişta hesban welatan dagir dikin emin! Ewên ku malên xelkê bi zore desteser dikin em in! Ewên ku ji xwînrijandinê têr nabin em in!

Di dîroka rêveberên Tirkan de aşitî û lihevkirin nîne, xapandin û xefik danîn bûye çand. Ev çanda neyarên meye û em wanan baş dinasin.

Divê neyê jibîrkirin; milletê me xwedan çandekî giranbuha ye û di nava dîroka mirovahiyê de rolekî wî yê sereke heye. Em dizanin piştî hemû serên dijwar jî, teqez aşitî heye. Milletê me heman demê bihevre jiyan û aşitî weke bingeh dibîne û ev hişmendî hêjî weke çandekî berdewam dike. Ji ber vê çandê, Kurdiśtanêde gellekî milletên dîtir, olên cuda, mezheb û terîqetên ji hev cuda hebûne/hene.

Li welatê me hemû millet, ol, mezhep û ramanên pir reng hebûne, rexmî hemû zordariyê jî ew pir rengî û pir dengî neha jî berdewam e. Misilman, cuhû, xirîstiyan, dawudî, sabiî, zerdeşt, elewî û êzidî, ereb, fars, asurî, keldanî, tirkmen û ermen hêjî bihevre jiyanê berdewam dikin. Ev çanda dewlemend tenê kare bi aşitiyê were paraśtin.

Ev pêvajo divê weke daxwaza dewleta Tirk neyê bideśtgirtin. Ev pêvajo rexmî hemu zilm û zordariyê jî divê were bilindkirin.

Bi pêşengiya Rêber Abdullah Ocalan ev pêvajo hatiye deśtpêkirin. Lewre Rêber Abdullah Ocalan dizana çanda şerrûd bi pêşxiśtina aşitiyê zûtir têk diçe.

Her dema ku bandora aşitiyê li welatê me çêbuye, birêveberiya vê dewleta hov lawaz buye.

Ev birêveberî tenê bi şer û kuştinan xwe ser pîyan dihêle. Divê em bi aşitiyê vê çanda şerrud têk bibin.

Binêrin di dîroka bizava azadiya Kurdiśtanêde her demak û dengê aşitiyê bilind bûye, hêza vê bizavê du qat zêdetir bûye. Ji 1993'an bigre heta neha, hêzbûna bizavê bi aşitî zêdetir pêş ketiye.

Dijminê me bi şer û pevçûnan xwe dide jiyankirin, ji ber ku ev çanda wêye û jû sud wergirtiye. Em bi zanyarî û aşitiyê pêşdikevin, jiber çanda me eve.

Divê em vê pêvajoyî bi yekdengî û bi hêz pêş xînin. Ger em Kurd hemû bihevre vê pêvajoyê xwedî derkevin û yekrêziya mala xwe çêkin, dê serkeftin jî ya me be.

Dagirkeriya Tirk her car bi bihaneyeke nû komkujiyan pêk tîne

Parêzer û çalekvanê siyasî û hiqûqî Cibraîl Miśtefa diyar kir ku dagirkeriya Tirk di bin navê avakirina herêmeke bi ewle de dixwaze sînorên xwe berfireh bike û xaka Sûriyê dagir dike, bi vê bihaneyê komkujiyan li ser gelê Kurd pêk tîne û ev yek sûcên dijmirovî ne.

Ayşa Silêman/Qamişlo

Di derbarê komkujî û gefên ku dagirkeriya Tirk li ser gelê Kurd dixwe, parêzer û çalekvanê siyasî û hiqûqî Cibraîl Mistefa bersiva pirsên rojnameya me da, hevpeyvîn wiha ye:

Piştî ketina rêjîma Baas pêwîst bû aramî û aşîtî li Sûriyê çêbûya, lê bi êriş û gefên dagirkeriya Tirk re gelek komkujî li ser Bakur û Rojhilatê Sûrî pêk tên, li hember vê yekê tu kes dengê xwe nake, sedema vê yekê çi ye?

Piştî hilweşandina rêjîma Baas, hêviyên gelênê Sûriyê zêde bûn ku piştî ewqas sal ji kuştin, girtin, revandin û feqîrî wê Sûriyeke aram, aîtiyane, wekhev û demokratîk were avakirin. Lê mixabin hikûmetek hat ne li gorî hêviyên gelên Sûriyê bû. Zihniyeteke şoven çû, lê yek din şûna wê girt bi heman şêwazî, ev hikûmet bi siloganên xwe baş e, lê di pratîkê de wek rê û rêbazên rêjîma Baas e. Her tim bang dike ku em Sûriyê bi giştî temsîl dikin û îradeya gelê Sûrî temsîl dikin, lê di rastiyê de ne bi wî rengî ye. Tê dîtin ku li Idlibê li hember siyaseta Colanî gel derket, hikûmeta wî Ebû Emşa û Hatim Ebû Şeqra temsîl dike. Her kes dizane ku Ebû Emşa çiqas dizî û talanî kiriye, di heman demê de Hatim Ebû Şeqra jî çawa Hevrîn Xelef bi hovîtî qetil kiriye. Ev herdu kes li gor saziyên Navneteweyî sûcdarên şer in. El Colanî bi xwe jî ji aliyê Wezareta Derve ya Amerîkî ve tê xwestin û navê wî di dadgeha Iraqê de heye û biryara darvekirinê lê hatiye birrîn. Ji ber ku ew rêveberê HTŞ'ê ye û di Iraq û Şengalê de komkujî kirine. Li ser vî esasî ev hikûmet îradeya hemû gelên Sûriyê temsîl nake û di siloganên xwe de bang dike ji bo yekbûna axa Sûriyê. Di destpêkê de pêwste nîşan bike ku kî parçebûna Sûriyê dixwaze. Ji destpêka kirîza Sûriyê heya niha dihat dîtin ku kî parçebûna Sûriyê dixwaze, yek ev çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk ên ku navê Artêşa Azad li xwe kirine.

Di heman demê de dagirkeriya Tirk ji bo Mîsaqa Millî pêk bîne xwest Sûriyê dagir bike, lê ev yek çênebû, bihaneyeke nû derxist

ku bi navê avakirina herêmeke bi ewle dixwaze sînorên xwe berfireh bike. Di vê yekê de jî bi ser neket, dixwaze desthilatdariyeke Turkmen ava bike. Rêjîma Baas hilweşiya, lê heya niha çeteyên Emşat û Hemzat ên girêdayî dagirkeriya Tirk êrişî bendava Tişrîn û Pira Qereqozaqê dikin. Di heman demê de Ebû Emşa di hikûmeta nû ya Şamê de cih girtiye, ev tê wateyê ku di şekil de şêwazekî bi kar tînin û di cewher de heger bi hêz bin wê wek zihniyet û siyaseta Baas bin. Ji destpêka hilweşandina rêjîma Baas ve berpirsiyarê karê derve, wezîr û mîtên dagirkeriya Tirk rojana sardana Sûriyê dikin, ka helwesta hikûmeta demkî ya ku bi yekbûna axa Sûriyê bang dike, ji ber ku ev yek ji erkê wê hikûmetê ye ku sînorên welatê xwe biparêze û gelên welatê xwe biparêzê, lê heya niha helwesta hikûmeta nû li hember êrişên dagirkeriyê derneketiye. Di heman demê de daxwaz dikin ku divê QSD'ê çeka xwe deynin, herkes dizane ku projeya QSD'ê xuyaye, heger Colanî û çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk bê proje bin, lê Kurd ji destpêka avabûna Rêveberiya Xweser ve xwedî proje ne. Rejîma Baas hikûmetek nijadperest bû û gelek komkujî di derheqê gelan li Sûriyê pêkanîn û îro jî binpêkirinên ku di derheqê gelên Elewî de tê kirin li ser heman hişmendiya ku rêjîmê dikir. Heger ev hikûmet bi vî rengî bimîne wê Sûriyê ber bi xeteriyê ve here.

Hebûna dagirkeriyê li ser axa Sûriyê ne hiqûqî, ne qanûnî, ne exlaqî û ne fermî ye, lê li hember vê yekê ti kes dengê xwe nake, çima?

Bêdengiya her kesî ji bo hebûna dagirkeriyê li ser axa Sûriyê vedgere du sideman; yek rejîma desthilatdar a Baas ku Sûriyê firotibû, dema peymana Adena bi dagirkeriya Tirk re îmze kir, yek ji xalên vê peymanê ew bû ku ji mafê dagirkeriya Tirk e êrişan

hundirê sînorên Sûriyê de pên bîne. Li gorî vê peymanê wê êrişî kî bike, helbet wê êrişî herêmên Kurdan bike. Heya ku hikûmeta Baas desthilat bû, çiqas me di milê hiqûqî û qanûnî de dinirxand jî, lê dewleta Tirk digot ez nedagirker im ez li gor peymana Adena derbasî axa Sûriyê bûme. Hikûmeta Şamê ya nû tevî ku gelek biryar û destûr rakirin jî, lê tu helwestên xwe li hember vê peymanê dernexist. Ebû Emşa di nav hikûmeta Şamê de cihê xwe digire, lê çeteyên girêdayî wî êrişî Bendava Tişrînê dikin. Di heman demê de mirovê ku di zihniyeta xwe de ne azad be, di siloganên xwe de jî azad nabe, dema Colanî desthilatdarî ket destê wî de, hemû partiyên serbixwe û yên li dijî desthilatdariya rejîma Baas, ji bo Colanî dan çepikan û biryarên wê erê kirin. Heya niha ti helwestên xwe li hember hikûmeta demkî dernexistine, tenê gelê Durzî helwest nîşan daye ku dibêjin; biryarên El Colanî me temsîl nakin. Armanca bingehîn ji avakirina Yekîtiya Navneteweyî aramî û aşitî ye, lê dema em bala xwe bidinê di piratîk de tiştek wisa nîne. Di vê yekîtiyê de 5 dewelet hakim in. Çi biryar derkeve yek ji van dewletan li gor berjewendiyên xwe mafê Vîto ya redkirinê bi kar tîne. Dewletên din bê rol in. Yekîtiya Navneteweyî bê hêz e. Di sala 2015'an de biryara Cenevre ya 2254 ku dibêje pêwîste agirbest li Sûriyê were ragihandin û aşitî çêbibe, lê li hember vê yekê Astana û Sûtşî derket. Di sala 2017'an de biryar derket ku şer bisekine û rewş aram bibe, lê ev biryar xapandina herî mezin bû ji îradeya Navnetewî re. Ji ber ku ev ne biryarek Navneteweyî bû ev biryar li gor berjewendiyên Rûs, Îran, Tirk û di bin re erêkirina hikûmeta Şamê de bû. Qaşo biryar parastina gelê sivîl bû lê hat dîtin ku piştî ev biryar derket Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî hatin dagirkirin. diyare ku Yekîtiya Navneteweyî tenê yekîtiyeke şeklî ye. Komîteya Lêkolînên serbixwe ya Navdeweltî ya ji bo Sûriyê girêdayî Yekîtiya Navneteweyî ye raporan dinvîse û radestî Komeleya Mafê Mirovan dike. Lê ev rapor ne li gor siyaseta wan e, ji ber ku çiqasî di raporan de dihat nivîsîn ku dagirkeriya Tirk berpirsiyarê van binpêkirinên ku di Efrînê de tên kirine, lê di raporan de dewleta Tirk radikirin û ji şûna wê çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk dinvîsîn, ev tê wateya ku Yekîtiya Navneteweyî rola xwe nalîze.

Dem hatiye ku dagirkerî û çeteyên wê li ser asta Navneteweyî werin dadgeh kirin, ji bo ev yek pêk were pêwîste çi were kirin?

Dema em li dîrokê vedgerin dibînin kesên ku binpêkirin, komkujî, sûcên li dijî mirovahiyê û dagirkerî kirine heya niha nehatine darzandin. Dema em gel binrxînin, helbet em behsa hemû gelan dikin, ji ber ku mirovê sivîl xetek pîroz e û nêzîkbûna hemûyan yek e. Ji bo gelê Filistînê di sala 1946'an heya sala 2016'an 57 biryar derketin, lê di piratîk de 4 biryar tenê pêk anîn. Di heman demê de gelê Efrînê 7 salan di Şehba de jiyan kirin, rojane dagirkeriya Tirk gel topbaran dikirin, rêjîma Baas berî hilweşandinê 7 salan dorpêc li ser wan da meşandin ev hemû sûcên şer in. Lê di piratîk de hesab ji ti kesî nehat xwestin, Saziyên Hiqûqî hêza wan a pêkanîna biryaran nîne. Tevî ku me gelek dosya çêkirin û bi belge jî bûn û me rêkirin ji Saziyên Navneteweyî re jî, lê ya girîn ew e ku em erkê xwe berdewam bikin û hîn zêdetir dosya li ser van binpêkirinan hazir bikin. Lê em dizanin dosyayên hiqûqî li gorî berjewendiyên xwe pêk tînin, dema berjewendiyên xwe yên siyasî bidin aliyekî bi hezaran dosyayên hiqûqî hene heya niha ti kesî dest jî neavêtiye wan.

Gelên Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê 7 salin rastî binpêkirinan tên, di milê pratîk de Yekîtiya Navneteweyî û Saziyên Hiqûqî tiştek nekirin. Di heman demê de li Efrînê komeleya Mafê Mirovan ji bo binpêkirinan, di milekî de rapor derdixistin ku çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk binpêkirin kirin, lê di milekî din de heman sazî bi girêdayî Yekîtiya Navneteweyî ye û di Efrînê de karê xwe berdewam dike û rêxistinên xwe jî derbasî wir dikirin. Berî her tiştî ya ku tê xwestin pêwîste Yekîtiya Navneteweyî ji nû ve xwe ava bike. Heger bi vî şêwazî bimîne, êdî nema baweriya ti kesî pê tê. Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî pêwîste sîstema xwe ya hundirîn biguherîne, di sîstema wê de mînak heya ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê karibin dosyakî radestî wan bikin, li ser kiryar û komkujiyên ku Erdogan di derheqê gel dike, pêwîste yê ku vê dosyayê radest bike endamê yek ji van dewletên ku cihê xwe di Yekîtiya Navneweyî de be. Em gelekî blindest in ewqas sal in ku dijmin tê me qir dike û hûn van şert û mercan li ser me ferz dikin.

Berxwedana li Bendava Tişrînê wê şoreşa me mayînde bike

Arîn Koçer

Dema m tevî hevalên gazî ji bo çûna bendava Tişrînê bi rê ketin ez gelekî, bi kelecan bûm û min xwe wiha his dikir ku ez ê biçim nava şerekî germ ê mîna şerê li hemberî çeteyên DAIŞ'ê. Ji ber dijmin bi qasî êrîşî hevalên li eniyên şer dike, ew qasî jî êrîşên nemerd li dijî sivîlên li ser bendava Tişrînê jî pêk tîne. Lewma mirov xwe di navşerekî dijwar de his dike. Dewleta Tirk a dagirker bi balafiran êrîşî gelên li bendavê ji bo parastina xak û kerameta xwe di nav berxwedanê de ye dike. Lê tevî her tiştî jî gelên bi salan e bi hesreta azadiyê ne, paşde gavan navêjin. Pir bi wêrekî li ber xwe didin. Ji dijminên bav û kalan re dibêjin, "Em hene û li vir in. Hûn çi dikin bikin. Em ê teqez bi ser bikevin."

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûr,yeyê vîna xwe ya azad li wir dane diyar kirin û ev jî cihê kêfxweşiyeke pir mezin bû. Di heman demê de jî gel ji keç û kurên xwe yên têkoşer hêz digirin. Şervanên YPJ û QSD'ê yên bi îradeyeke mezin di nav berxwedanê de ne manewiyeteke xurt ji gel û jinan werdigirin. Jixwe dema mirov li rûyê jinan, dayik û bavan dinêre, ronahiya hêza Rêber Apo xuya dike v jî ji bo

me hemûyan dibe hêza têkoşînê. Ya rastî hêza vîna gel a ji pola çavkaniya xwe ji bîr û bawerî, fikir û ramanên Rêber Apo digire. Jixwe hedef û armanca dijmin jî ew e, bi êrîşên xwe yên dijwar gel bitirsîne û berxwedaniya wan têk bibe. Lê gel bi gotina, "Em ji mirinê mezintir in" bersiv dide dijminê har û hov.

Dema me sekna gel a dilwêrek didît em jî hîn bêhtir kêfxweş dibûn. Ez bi xwe jî dema çûm Bendava Şehîdan, li beramberî wê berxwedana bêhempa a gelan heyecan û coşeke terîfa wê zehmet e ez dorpêç kirim. Ev rastiyeke bênîqaş e ku ti hêz wê nikaribe li hember vê berxwedan û têkoşîna muezem a gelan û şervanên wan bisekine. Jixwe gelek hevalên gaziyên şer jî bi me re bûn. Tevî her tiştî jî xwedî sekneke pir xurt bûn û digotin, "Em ê biçin bendavê. Ev der cihê şerefê ye. Em tola xwe ji dijminê

xerab hiltînin û wê serketin a me be." Hebûnahevalên gaziyên şer a li bendava şehîdan hêz, moral û menwiyeteke xurt dide xelkê sivîl ê di nav berxwedanê de. Dema em li wir bûn di êrîşa balafirên dewleta Tirk a dagirker de hevalekî gaziyê şer birîndar bû. lê qet moralê heval xerab nebû, coş û heyecana wî kêm nebû.

Bila dewleta Tirk a dagirker zanibe ku wê ti caran nikaribe welatê me dagir bike. Heya ew gelên fedaî û şervanên wan ên qehreman hebin wê têkoşîna wan jî berdewam be. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi salane xwe bi fikir û felsefeya Rêber Apo perwerde dikin. Bûne xwedî vîn û cesareteke pir mezin. Divê were zanîn ku Rêber Apo em gihande vê rojê, em kirin xwedî partî û artêş. Hewce ye em jî ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo berxwedanê mezin bikin. Her wiha ji bo fikir, felsefe ^+u îdeolojiya Rêber Apo bigihîje hemû gelan em timî di nav têkoşînê de bin.

Weke gaziyên şer, gel û şervanên YPG, YPJ û QSD'ê divê em têkoşîna xwe bi ser bixin. Vîna gelan di ser her hêz û tekníkê re ye. Careke din soz didin şehîdên bendava Tişrînê ku em ê welatekî azad û demokratîk diyarî wan bikin.

Bêguman yê em bi tevahî fêrî berxwedaneke wer mezin kir, Rêber Apo ye. Ji bo em bibin layiqî Rêber Apo û şehîdan yaji me tê xwestin ew e bêteredut û bê fikar em têkoşînê mezin bikin, armanc û hêviyen şehîdan bi serketinê tacîdar bikin.

"QSD temsîla hemû Kurdan nake (!?)"

Reşo Meydana

Kurd hene ku dema Tayip Erdogan li Enqerê dikuxe hema nake du, jê re destmalê digihîne ber difna wî. Hema kengî banî dike, di cih de xwe digihîne ber pêsîra dagirkeran. Efrîn tê dagirkirin, Serêkaniyê tê dagirkirin, Girê Spî li ber avê diçe, nabêje kîjan artêşa dagirker pêlî erda bav û kalên min kiriye. Berevajî, diçe û dibe baskek ji wan çeteyan yan jî hewl dide bibe.

Kurd hene ku li Rojavayê welêt ev çendîn sal in qir û qiyamet e, tenê guleyekê jî ne diavêje dijmin û ne jî fikreke wan a wisa heye. Ne jî ji civaka Kurd re, ji cîhanê re li ser rewşa Kurdan tiştekî xêrê dibêje; xwe digihîne Qesra Spî yan Qesra Kremlîne, Pekîna Sînê, Tokyo gilî û gazinca birayên xwe yên Kurd dike.

Kurd hene, ew ji xwe re wisa dibêjin bila bêjin, dagirkeriya Tirk bombe dibarîne nav govenda wan, av û kerabeya bi sedhezaran welatiyên Ereb, Kurd, û heftê du miletan qut dike, ji wan re nabêje "serê we sax be, em jî Kurd in, êşa we parve dikin". Lê heman Kurd dema li cihekî seyahî (tûrîstîk) yê Tirkiye agir derdikeve û hejmarek mirov dimire sersaxiya Tayip Erdogan dixwazin. (bila bixwazin, lê çima êşa birayên xwe nabînin?)

Belê, ev kîjan Kurd in hema ne hewce ye mirov bîne ziman jî. Di wêjeya gelerî de ji van re, çi Kurd be, çi Ereb be, çi Tirk be, jê re dibêjin 'kewê Gozel'. Kewê gozel çi tişt e? Yê dizane jixwe dizane. Ji bo yên nizanin: Nêçîrvanên kewan ji kewên nêçîra wan dikin hinekan kedî dikin, serjê nakin yan jî nafiroşin. Hûn ê bêjin çi lê dikin? Ma yek diçe nêçîrê ku jê feyde bike. Ne welê ye! fen û fîtên nêçîrvan xelas nabin. Piştî ku wê kewê kedî dike, dixe nava qefesekê. Dema diçe nêçîra hemcinsên wî, wî kewî bi xwe re dibe. piştî ku nêçîrvan xwe digihîne welatê kewan, wê qefesê bi bêhna fireh li cihekî xweşik bi cih dike û xwe jî ji ber çavan dide aliyekî. Kewê me yê nava qefesê dest pê dike bixwîne: "qaqibo qaqibo, qaqibo..." yanî çi dibêje ev kew ji hemcinsên xwe re? "Werin, werin, ez li vê derê me". Dema kewên nava xwezayê lê kom dibin, nêçîrvan pêlî textika tifinga xwe dike yan jî dafika vedaye tije kewên reben dike. Vaye ji vî kewê me yê nava qefesê re dibêjin 'kewê gozel'.

Gotineke pêşiyan heye dibêje, 'ji kesên arif û zane re ne hewce ye tu tiştan tarîf bikî'. Yanî ya li ber çav, jixwe li ber çav e, ne hewce ye tu bêjî wisa ye, welê ye û nizanim çawa ye. Ev Kurdê ku ji Kurdiniyê re, ji mirovbûnê re bêxem be lê wekî ku îbadeta xwe bike li dijminê gelê Kurd miqate be, xwedî lê derkeve, hemcinsê xwe bixapîne, wekî kewê gozel, di rastiya xwe de jî ne Kurd e.

Rast e, QSD'ê temsîla vî Kurdî nake û nikare bike jî. Em ne abûqetên wê ne. QSD ne hewceyî vê ye jî. Çi dike QSD, YPG û YPJ? Gelê Kurd diparêze, ji DAIŞ'ê, ji dagirkeriya Tirk, ji çeteyên dagirkeriya Tirk û ji hemû xêrnexwazan diparêz e. Gelên Ereb, Tirkmen, Ermen, Suryan, Aşûrî, Çerkes diparêz e. Piştî ku bihara gelan gihîşt welatê Sûriyê, YPG, YPJ û QSD, heya roja îro di parastina welêt û gelan de zêdetirî deh hezar şehîd daye. Du sê qat zêdetir jî birîndarên şerê gelê şoreşgerî çêbûne. Gelê Kurd, Ereb, Çerkes, Ermen, Tirkmen, Aşûr, Suryan êş û azarên nayên ziman kişandine. Yekîneyên Parastina Gel timî ji bo ku êşên gelan kêm bike, bi fedayiyane xwe avêtine eniyên şer, şer kirine û şehîd bûne yan jî birîndar bûne. Ti dem û wexta wan yan jî fikra wan tinebûye ku qefesa 'kewê gozel' bihêjînin û biçin nêçîra kewan û biçin Enqerê, ber destê Tayipê xwînxar.

Ji ber wê yekê rast e ku QSD'ê temsîla Kurdên ku bûne kewê gozel, nake. Ya din jî qe ti car temsîla Mesrûrê Barzanî nake, û nikare bike jî.

Roja Cîhanî ya Zimanê Dayikê

Ahmet Aktaş

Ev roj (21'ê Sibatê), ji aliyê Rêxistina Çand, Ziman û Zanîstê ya Neteweyên Yekbûyî UNESCO ve di sala 1999'an de, weke Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê hatiye ragihandin. Kurtedîroka wê wisa ye: 73 sal berê gelê Bangladeşê, li dijî siyaseta dewleta Pakistanê ya ferzkirina zimanê URDU li ser wan, ne razîbûna xwe diyar dike û ji bo bidestxistina mafê zimanê xwe yê dayikê têdikoşe û biser dikeve.

Ji aliyekî ve dişibe rewşa Kurdistanê. Pakistanî di 1947a de dewleta xwe ava dikin û erdnîgariya xwe weke du herêman destnîşan dikin; 1-Pakistana Rojhilat(Bangladeş), 2-Pakistana Rojava(Pakistan) û mîna tirkan biryara yekzimanî(URDU) distînin. Bangaldeşiyan di 73 salan de xwe ji bindestiya wan rizgar kirin, lê Kurdistaniyan 100 sal derbas bûye, hîn xwe ji siyaseta bişaftin û qirkirinê rizgar ne kirine. Bila ev jî rexneya li ser me be!

Li ser vê nakokiya dîrokî, gotinên balkêş ên du akademisyenên tirk hene.

Prof.Dr.Celal Şengor û Prof.Dr.İlber Ortayli, li ser rastiya zimanê Kurdî wisa dibêjin:"Divê em zimanê kurdî rast nas bikin, bi mezinbûna xwe li cîhanê di rêza 7a de ye. Li kitêbxana me lugata zimanê kurdî heye ku di sala 1879a de li bajarê St.Petersburg a Fransayê hatiye çapkirin; bi navê dictonnaire kurde-françaus(kurdî-Fransî), lê mixabin lugata zimanê tirkî nîne"

Van akademsiyenên navdarên tirk, him rexneya li dewleta xwe dikin, him ji bo zimanê xwe xemgîniya xwe diyar dikin, jiber ku çima li welatê wan sazî û akademisyenên wisa nine û berhemên wisa zanistî na afirînin!

Divê ji vê rexneyê em jî para xwe hildin. Jiber ku kêm be jî akademisyanên biyanî, ewqas pesnê zimanê me vedidin, lê em dereng mane, îca divê em rewşenbîrên kurd, pirtir li zimanê dayîka xwe xwedî derkevin!

Li ser jiyana civakê, bandor û rola ziman bingehîn e. Ev taybetmendî, him erênî him neyînî heye li ser jiyana civakê û gelan.

Weke çeka leşkerî, çawa dualî; bi erênî ji bo parastin û pêşketina civakê, bi neyînî ji bo dewama diktatoriya destîhilatdaran dikare were bikaranîn, ziman jî dikare dualî heman rolan bileyze li ser jiyana civakê.

Li vira rola zihniyeta kesan jî derdikeve hole. Weke mînaka çekê, di destê kê de ye û ji bo çi armancê tê bikar anîn? Ev xal giring e. Jiber ku kesê xwedî zihniyeta neyînî, li ser civakê bi armanca xerab bikar tîne, ji rêya rast dûr dike, dujminatiyê dixe nava kesan û gelan. Belê, yên xwedî zihniyeta pak jî ji civakê re jiyana azad û aram diafirîne.

Hilbet divê em ji bo parastin û xurtkirina civakê, bikaranîna zimanê erênî, ji xwe re bikin armanca serekê. Ev taybetmendiya ziman a qenc, divê bibe xala bingehîn a rojeva hemû gelê welatparêzê Kurdistanî!

Li goreyî pîvanên zanistî, mirov ji zarokiya xwe ve, bi zimanê dayîka xwe baştir bi pêş ve diçe, bêhtir serkeftî dibe di jiyanê de.

Li ser vê mijarê, hinek gotinên dapîr û bapîran jî hene, dibêjin:

Zimanê biyanî kiras e, zimanê dayîkê çerm e!

Çavê li deriya xwelî li seriya!

Gîha, li ser koka xwe şîn dibe!

'Hêza ku planên dagirkeriyê eşkere dike tê hedefgirtin'

Rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tekez kirin ku ji ber bêdengiya navneteweyî êrişên dewleta Tirk dewam dikin û gotin, "Dewleta Tirk a dagirker li çar perçeyên Kurdistanê rojnamevanan dike hedef, divê destgehên parastina mafê rojnamegeran jî bêdeng nemînin û bi erkê xwe rabin".

Esma Mistefa/ Qamişlo

Dagirkeriya Tirk ji salên durûdirêj ve gelê kurd û xaka Kurdistanê xistiye hedefa xwe. Di oxira wê yekê de hemû kesayetên siyasetmedar, rewşenbîrên, rojnamevan û gelê sivîl têne biçavkirin û qetilkirin. Ev şer bi taybet bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê re bi awayekî eşkere kete meryetê û komkujiyên li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêdetir bû. Di van şer û sûcên bî mirovî de bi dehan kesayetên rojnameger hatin hedefgirtin û şehd xistin. Bi taybet li Rojavayê Kurdistanê bi dehan rojnamevan û nûçegihan hatin şehîdxistin. Dagirkeriya Tirkiyê ne tenê van êrişan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîne, ji bo hedefgirtina felsefeya azadiyê li çar perçeyên Kurdistanê van kiryaran pêk tîne. Herî dawî mamoste û rojnamevanê kurd ku bi salan e di Çapemeniya Azad de xebat daye meşandin, Azîz Koyluoglû bi nasnav (Kemal) di 27'ê Çileyê de li Ranyayê di êrîşa dewleta Tirk a dagirker de şehîd bû.

Derbarê êrişên dagirkeriya Tirk û bi taybet hedefgirtina rojanamevanên dengê rastiyê, rojnamevan Zinar Cafer û Sîmav Keleş ji rojnameya me re axivîn.

'Şehîd Kemal mamosteyê jiyanê bû'

Zinar Cafer

Silva Keleş

Zinar Cafer di destpêkê de şehadeta rêheval Azîz Kuyluoglû bi bîr xist û derbarê naskirina wî de wiha got: "Bê guman îfadekirina naskirina rêhevalekî weke rêheval Kemal gelek bi êşe û dibe ku mirov nikaribe heq bidiyê. Min di sala 2024'an dema ez di perwereya ragihandinê de bûm ew naskir. Di wir de nêzî 4 heyvan me bi hev re jiyan kir. Bi rastî jî weke rêveberiyê akademiyê bû, lê li kêlek her endamekî weke rêhevalekî bû. Di aliyê jiyanê de gelek kêliyên me yên bi wate bi hev re çêbûn. Weke rêhevalekî di akademiyê de di aliyê jiyanî, pirsgirêk, rexne û disiplîna kar û jiyanê de xwedî rolekî bingehîn bû. Di çareserkirina pirisgirêkên ku derdiketin de bi awayekî îdeolojîk nêzbûyîn û çareserkirin gelek bi bandor bû. Di wê dereyê de di nava 35 hevalên rojamevan de ez tenê ji Efrînê bûm, ez bixwazim nexwazim hin cudahî û veqetîn ji derdor dihate jiyankirin. Lê belê heval Kemal hêşt ku têkiliyeke ruhî di navber min û wan de bê avakirin. Yek car jî ez nedam hîskirin ku ez xerîbim. Bi rastî me di kesayeta wî de rêhevaltî, xebatê ragihandinê, girîngiya îdeolojîk di xebat de naskir û ji bo me bibû mamosteyê ku her kêliyên jiyanê bi te dide naskirin û şîrovekirin."

'Ji ber ku rastiyê eşkere dikin têne hedefgirtin'

Zinar Cafer di berdewamiya axaftinê de bal kişand ser hedefgirtina kesayetên bi bandor di Tevgera Azadiyê de û wiha got: "Dagirkeriya Tirkiyê di destpêkê de hedefa xwe ew e ku kesayetên bi bandor yên di civaka Kurd de û bi taybet di nava Tevgera Azadiyê de ye. Bi hezaran rêhevalên pêşeng di nava Tevgerê de şehîd xistine û binçav kirine. Di heman demê de bi hezaran rojamevan û kesayetên siyasetmedar hatine û hê jî dibin hedefa dagirkeriyê. Ev rastî careke din di hedefgirtina mamosteyê mezin heval Kemal, Cîhan Bilgîn û Nazim Deştan de tekez kir ku her tim pêşengên civakê, pêşengên ku ji bo azadiyê û eşkerekirina pilanên wan, hêza ku maskeyên wan yên durûtiyê eşkeredikin; dibin hedefa dagirkeran. Ji lewra li Rojava, Bakur, Rojhilat û Başûrê Kurdistanê pêşengên Tevegra Azadiyê tên armanckirin."

Artêşa Ragihandina Azad li pey xwe gihandin

Di heman çarçoveyê de Sîlva Keleş bal kişand ser bêdengiya cîhanê û wiha bi dawî kir: "Bê guman ev yek ji siyaseta dagirkeriyê ya qirkirinê tê. Hemû pilanên hedefgortina rojnamevanan bi taybet bê hesab û ceza têne kirin. ev yek bê guman nayê qebûlkirin. ji ber raya gişti li hember van cûcan bêdengin. Li hember tevahî kiryarên girtin, binçavkirin û qetikirina rojnamevanan tavahî destgeh û rêxistinên parastina mafê rojnamevanan bêdengin."

Helbet ev bêdengî wê çawa were pirotestokirin û teşhîrkirin, bê guman bi hêz, vîn û îradeya bi hezaran ji şagirtên wan pêşangan wê bê kirin. Em şagirtên Eeyid Evran û Kemalan in. artêşekî ji ragihandin û xebatkarên çapemeniyê di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatiye avakirin. Helbet şop û armanca ku wan li ser jiyan dikir emê bidomînin".

Bendava Tişrînê

Cîger Efrîn

Li vê cîhanê dengê herî xweş, dengê herî ku dilê mirov radike dîlanê, dengê ku di her hêla jîyana mirov de guhartinan çêdike û her rêya guhartin û veguhartinan vekirî dihêle, bê guman dengê berxwedanê ye! Yên bi azadîyê bawer û xwe nas dikin li ber xwe didin.

Yên ku derdê wan hene li ber xwe didin. Yên bi êşa xwe û êşa kesên derdora xwe dihesin û dixwazin xwe û derdora xwe ji êş û kederan xelas bikin li ber xwe didin. Yên ku ne dixwazin kole bijîn û ne jî bibin koledar li ber xwe didin. Yên ku naxwazin jin kole bijî li ber xwe didin. Yên ku naxwazin hawirdora wan xira bibe û siberojeke xweş ji zarokên xwe re bihêlin li ber xwe didin. Bi kurt û kurmancî; Yên ku ji xwe re dibêjin ''ez mirov im û divê em mirovane bi hev re bi reng û dengên xwe bijîn'' li ber xwe didin. Belê, îro berxwedana li Bendava Tişrînê tê meşandin berxwedana wijdana mirovahîyê ye, û ji lewra jî divê mirovahî pirtir li vê berxwedanê xwedî derkeve. Bendava ji nav û hebûna xwe mezintir. Bendava bi berxwedana keç,xort û gelê berxwedêr nav û deng daye. Bendava ku bûye kelem di çavên neyaran de. Ji neyaran re bûye xewnereşke kujer. Heta berîya du mehan dunyayê navê Bendava Tişrîn'ê nebihîstibû. Lê îro paytext û bajarên derdorê, heta welatên cîran bi Bendava Tişrînê têne nasîn. Berxwedana Tişrînê careke din ruh da û dide gelên Bakur û Rojhilatê Surîyê û mirovahiyê. Ji lewra berxwedana Tişrînê bi Tişrînê re sînordar nema. Di rastîyê de tu berxwedan bi cih û warê ku lê tê kirin(hatî kirin) re sînordar nema û namîne.

Ma berxwedana Mazlûm'an, berxwedana çar lawên Agir û Rojê, berxwedana Kemal, Akîf, Elî û Xeyrî'yan bi zîndana Amed'ê re sînordar ma? Ew berxwedan neba, PKK nedibû PKK!

Ma berxwedana Egîd'an bi Eruh û Şemzînan re sînordar ma? Ew têkoşîn û berxwedana Egîd'an, Şîyar'an, Bedran'an neba, hebûna Kurdan nedihate peyandin û îro Kurd li ser rûyê erdê nediman. Berxwedana Bêrîtan'an bi Xinêrê re, ya zîlan'an bi Dêrsim'ê re sînordar ma? Ew berxwedana neba jina Kurd nedibû hêz û civaka Kurd nedihate guhartin! Va ye! Berxwedana Rêber Apo! Ma berxwedana Rêber Apo bi zîndan û dojeha Îmralîyê re sînordar ma? Berxwedana Rêber Apo ya ji zarokatîyê de û bi taybetî jî ya li dojeha Îmralîyê neba em wekî gel û mirovahî nedigihan asta ku mirovahî li Rêber Apo xwedî derkeve û em nedibûn xwedî felsefeya azadîya civkê, emê bi destxistina dewletê sînordar bimana, ku Rêber APO bi hûnandina paradîgma Modernîteya Demokratîk re em wekî gel û mirovahî kir xwedî çeka herî xurt li dijî hemû cureyên êrîşan û me bi serkeftinê jî ewqasa bawer nedikir. Belê, heger berxwedana Rêber Apo neba îro me qala berxwedana Bendava Tişrînê jî nedikir. Ji ber ku wê plana qirkirin û tunekirina Kurdan ya ku di sala 1925'an de ketibû meryetê bigihîşta encamê û Kurd nediman. Berxwedana Bendava Tişrînê birqandina felsefa Rêber Apo ya berxwedanê, ya şerê gelê şoreşgerî ye!

Ji roja ku Rêber Apo derketî ser dika sîyaseta Kurd felsefa berxwedanê di cerg û hinava gelê Kurd de çand û îro jî em wekî gel û mirovahî bi gîyana wê berxwedanê ber bi serkeftina mezin ve dimeşin. Wekî Pêşengê me rêheval Mazlûm Dogan gotî; ''teslîmîyet dibe îxanetê, berxwedan jî dibe serkeftinê''Em wekî civaka mirovahîyê bêhna serkeftina misogerî dikin û em ê bi Rêberê xwe re cejna azadîya gelan pîroz bikin. Nêzîkbûn û dûrketina wê rojê bi rêxistinkirina me ya civakê û xurtkirina xeta têkoşîna şerê gelê şoreşgerî ve girêdayî ye!

FENER

Siwarê Hespê Heqîqetê Kurê Çiyayê Kurmênc Egîd Roj

Idrîs Henan

Ez ne tenê rojnamevan bûm, şahidê dîrokê bûm û heta kêliya dawî ya jiyana xwe ez ê wisa dewam bikim".

Nirxtirîn û birûmetirîn pênaseya rojnamegeriya azad a ku berjewendiya gelan a serxwebûnê esas digire, bê guman, gotinên Şehîd Egîd Roj in. Rojnamevanê pakrewan ku di oxira heqîqeta ji bo wê têkoşiyaye, jiyana xwe feda kiriye û gihaye zîrweya rastiya mutleq, Egîd Roj yek ji rêzecangoriyên leheng ên fedayî yê nemir e. Bi qasî dilsoziya ji dozê re, her kêliyê amade bû ku giyana bibexşîne. Ji xwe berî şehadeta wî bi du rojan behsa girîngiya fedayetiya di oxira ronîkirina heqîqeta berxwedana li Bendava Tişrînê têye raberkirin dikir û weke erkekî gerdûnî yê rojnamevanan lê dinêhêrî. Ji lew re tekezî li wê yekê dikir ku aliyên dervayî heqîqeta li bendavê tevdigeriyan weke rojnamevanên destîhilatdariyê pênase dikirin. Di wê derbarê de gelek caran qala rojnamegeriya neteweyî, welatparêz û azad dikir.

Egîd Roj di peyama xwe ya dawî de tekezî li nerîna xwe ya şoreşgerî dikir û berxwedana li bendavê weke "Qehremaniya ku hêj di pirtûkan de nehatiye nivisîn" pênase dikir û weke domahiya berxwedana Çiyayên Efrînê, Şehba û kampên wê digirt desî. Ango; bi wê zanebûna xwe ya dîrokî û bi hafîzeyeke tije hesret û bîranîn û bendewariyên gewre re, li Bendava Tişrîn şahidiya dîrokî ji têkoşîna ronahiyê ya li dijî tarîtiyê dikir. Ji ber vê jî hêviyên wî ew bûn ku ev şahidî bibe para her kesî xwedî nirxên azadî û demokrasiyê ku li hemberî bêedaletiyê bibin xwedî wijdan. Ji kesên ku xwe jî vê misyonê didan alî re digot: "kesine bê wijdan in".

Berxwedana gel û şêwegirtina rêbaza têkoşîna Şerê Gel ê Şoregerî bala wî dikişand û li ser wê bingehê bi tekezî hêviyên xwe yên serkeftinê dianîn ziman û weke wateya herî bilind a sebir û îradeya têkoşîna gelan pênase dikir.

Siwarê hespê kihêl, zarokê Çiyayê Kurmênc, Şehîd Egîd Roj di her kêlî û axaftinê de behsa biriyên xwe yên ji Efrînê re dikir û weke hesret û kulekê di dilê xwe de dihewand. Ji lew re jî; çendîn mijarên gotinê cuda bûn, Efrîn mijara wî ya sereke bû. Di aramanca wî ya bingehîn de rizgarkirin û vegerek birûmet hebû. Ji bona wê jî, di çeperên pêşîn ên herdu qonaxên Berxwedana Serdemê li Efrîn û Şehbayê cih digirt û bi cesaretek bê hempa êriş û tadeyên li ser gelê me belge dikirin û rastiya dijminekî hov û dermirov bi raya giştî re parve dikir.

Egîd xwedî baweriyek mutleq bû ku rojek dê were û hêviyên wî yên rizgarkirina Efrînê wê bi cih werin û ew hêvî weke "Pêlên qet namirin" pênase dikir. Lê di heman demê de, ji ber ku mirovek realîst bû û dijminê xwe yê xedar baş nas dikir, metirsiyên xwe yên neditina roja rizgarkirina Efrînê jî bi bîr dixistîn û wiha vedigotin "Erê, dibe ku ez bi xwe serketinê nebînim, lê ez bawer dikim ku bajarê min Efrîn wê rojekê azad bibe. Xwazî min Efrîna rizgarkirî bidîta. Lê ez dî wê baweriyê de me ku ev hêsta serketinê û vegerê wê jî aliyê gelê me ve bê jiyîn".

Ji ber vê jî pakrewan û lehengê Ragihandina Azad Egîd Roj ji gelê Efrînê yê ku 8 sal in ji bo vegerek birûmet li ber xwe dide, dixwest ku ji armanca xwe dûr nekeve û di peyama xwe de tekezî li gel dike ku; "Divê ev berxwedan hê bêhtir xurt bibe".

Lew re jî, em weke rojnamevan, rêheval û bi taybet gelê Efrînê tekezî li wê yekê dikin; dê xeyalên siwarê hespê heqîqetê, pakrewan Egîd Roj, weke giyana wî zindî bimînin. Wê di rojek nêz de, rêhevalên wî, peyama wî li Qada Azadî bixwînin û ala ku hildaye, li çerxerêya Kawayê Hesinkar daleqînin.